

Qayîlbûn (Rêdan)

Agahiyên tu di vê formê de didî agahiyên te yê şexsî dixê nav xwe. Qanûn, qanûna federal ya tenahiyê jî (*Commonwealth Privacy Act*), piştgiriya parastina agahiyên te yê şexsî dike.

Em sîstêmeke elektronî (*IT*) ya bi navê '*Data Exchange*' bi kar dihînine bo parastina agahiyên derheqê te de. Wezareta Xizmetên Civatî ya Hukûmeta Australî (*DSS*) serpereştiya vê sîstêmê dike. Agahiyên şexsî yê di vê sîstêma parastina agahiyan de tenê bo me vekirî ne da em doza te bi rê ve bibin.

Tu ne neçar î qayîl bibî agahiyên xwe yê şexsî bidî Wezareta Xizmetên Civatî. Ger tu qayîl nebî em agahiyên te yê şexsî bi dest xî, ew bandorê li xizmetên tu bi dest dixî nake. Ger tu qayîl bî agahiyên xwe yê şexsî bidî Wezareta Xizmetên Civatî, dikarî her dem bixwazî ku ew agahiyan werin rakirin.

Wezareta Xizmetên Civatî agahiyên te bênav dike. Yanê, agahiyên derheqê nasnameya te de, yan ewên dikarin bo naskirina te werin bikarhanîn (nimûne: xuyakirina navê te) radike.

Wezareta Xizmetên Civatî agahiyên te di şûna bi navê '*Data Exchange*' de dixê nav agahiyên kesên din, bo dîtina meylên di asta bernameyê de. Ev agahdarî ji bo birêxistina şêweya rêvebiriyê (*policy*), birêvebirina bernameyên dayînen diravî (*grants*), û birêxistina lêkolînan û nerxdanan dihên bikarhanîn.

Heye ku Wezareta Xizmetên Civatî van agahiyan bo amadekirina raportan bi kar wîne. Heye ku raport bi dezgehên din re werin parvekirin. Agahiyên di van raportan de bênav in.

Dikarî bêtir agahdarî, derheqê ka Wezareta Xizmetên Civatî dê agahiyên te yê şexsî çawa bi kar wîne de, di beşê '*DSS privacy policy*' de bibînî (beşê Rêvebiriya derheqê tenahiyê ya Wezareta Xizmetên Civatî de), di malpera wê de: <https://www.dss.gov.au/privacy-policy>.

Van şîrovekirinan di beşê '*privacy policy*' de hene:

- çawa di beşê agahiyan de (*Data Exchange*) li agahiyên xwe yê şexsî binihêrî
- çawa dikarî guherandina yan rakirina wan agahiyan bixwazî
- rewşên ku tê de Wezarata Xizmetên Civatî (*DSS*) dikare agahiyên şexsî bide wergirên xizmetan (*recipients*) yê li derveyê Australya
- çawa dikarî nerazîbûna xwe ragihîni ger Wezareta Xizmetên Civatî mercên prensîpên australî yê tenahiyê (*privacy*) *bişkêne*, û çawa *DSS* dê li nerazîbûna te binihêre

	Erê	Na
Ez qayîl im agahiyên min yê şexsî têkevin şûna parastina agahiyan ' <i>Data Exchange</i> '	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>
Ez qayîl im beşdare lêkolînen werin pêş, niherînan (<i>surveys</i>) yan nerxdanan (<i>evaluation</i>) bibim	<input type="checkbox"/>	<input type="checkbox"/>